Li gundê **Mozelanê** Dîtinek Bi Rêzdar **Hecî Dihamê Mîro** re

Apê hêja, li destpêkê, bi navê weşana NEWROZ ya ku bi zimanê kurdî li Sûriyê tê weşandin, em hêviya saxlemî, tendurustiyeke baş û temenekî dirêj ji we re dikin.

Di baweriya me de, gelê kurd, miletekî wefadar e, tucarî ew xebatkar û têkoşerên xwe ji bîr nake, rêz û rûmeta wan bilind diparêze, ji ber ku nifşê me yê îro, bi saya xwedê û serê wan xebatkaran îro xwe kurd nas dike, li zimanê dayika xwe xwedî derdikeve, xwîna kurdayetiyê di damarên wî de digere.

1-Pirsa me ya pêşîn ew e ku hun ji kerema xwe re, kurtejiyana xwe ji xwendevanên Newrozê re pêşkêş bikin?.

Bersiv*:Ez* ***Dihamê Mîro yê Mîro****, ji êla* ***Hesina*** *me, sala 1921an, li gundê* ***Sêgirka Mîro*** *ji dayik bûme, vêga, temenê min 86 sal e. Eve bêtirî 500 salî ye ku êla me li vê derê cîwar bûye. Bavê min, di komîta danîna sînorê navbera Sûriyê û Tirkiyê de endam bû. Niha, ez bê nasname me, ji ber ku di sala 1968an de, ew ji min hatiye kişandin, mixabin, niha, di welatê bav û kalên xwe de, ez biyanî me!!...*

2-Li gor em dizanin, di sala 1965 an de, Partî bûye du parçe, kongirek li kurdistana Iraqê ji bo yekîtiya partiyê hatiye li darxistin. Hun dikarin li ser vê babetê ji me re baxivin?.

Bersiv:Ev kongirê ku hun dibêjin, di dawiya Avdara sala 1970an de, bi serperiştiya seydayê ***Barzanê*** *li* ***Nawperdanê*** *hate li darxistin. Rêzdar* ***Derwêşê Mele Silêman*** *wê demê li Kurdistanê bû, weke mirovekî welatparêzî xweser, ji bo pêkanîna girêdana vî kongirî xebitî ye. Endamên kongir, ji herdu aliyên Partî(Çep,Rast) digel beşdariya hin kesayetiyên xweser ku ji kurdistanê em hatin vexwendin hate li darxistin.*

3- Rêvebiriya demkî(Qiyada Merhelî) çawa hate damezirandin, endamên wê kî bûn?.

Bersiv: Rêvebiriya demkî ji 13 kesan pêk hatibû, stubarê wê ew bû ku herdu aliyên Partî(Çep û Rast) bikin yek. Endamên wê, 4 endam ji ber aliyê Çep ve, 4 endam ji ber aliyê rast ve, digel 5 kesayetiyên xweser. Li gora tê bîra min, navê wan rêzdaran ev bûn:

** Ji aliyê Çep ve: Ismetê Seyda, Ûsivê Dîbo, Behcetê Mele Mihemed, Şefîqê Elo bûn.*

** Ji aliyê Rast ve: Temirê Mistê, Ibrahîmê Sebrî, Fêselê Hadî Axa,Restemê Mele Şehmo bûn.*

** Kesayetiyê xweser jî: Şêx Mihemedê Îsa, Selîmê Ûsivê Haco, Derwêşê Mele Silêman, Sadiq, Dihamê Mîro bûn.*

Komîteke şêwirdar jî hate bi navkirin, endamên wê jî ev rêzdar bûn: Mihemedê Mele Fexrî, Ebdela yê Mele Elî, Xalidê Meşayix, Kenanê Egîd, Mecîdê Haco. Piştî vegera me ji Kurdistanê, me hewil da ku em serkirdayetiya Partî bidin ser hev û li gor ji me tê xwestin, →